



Ji bo tevahiya dêûbavên, zarokên
wan diçin kreşên Berlinê

04.08.2021

Agahiyên ji bo dêûbavan ên di derbarê destpêkirina sala nû ya kreşê de

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

sala kreşê ya 2021/2022an li navendên lênêrîna zarokan ên li Berlinê bi awayê xebata asayî destpê dike. Em gelek kêfxweş in, ku ev gava ber bi rewşa normal ve pêkan e û tevahiya zarokan bêyî astengiyan dikarin ji mafê lênêrtinê sûdê bigirin.

Bûyerên enfeksiyonê yên li hêlînên zarokan di rêjeyeke gelek nizm de mane. Ji bo ku ev yek wisa bimîne, Welatê Berlinê stratejiya xwe ya testê û kampanyaya xwe ya derzîkirinê di hefte û mehên pêş de berdewam dike.

Girîngiya kampanyaya derziyê hêj zêdetir dibe. Wekî ku xuya dike, derfeta derziyê dê ji bo zarokan pêk newe, ji ber vê yekê bi awayekî taybet pêdiviya zarokan pê heye, ku kesên temenmezin ên li derdora wan, ango dêûbav, dapîr û bapîr û lênêrên wan derzî li xwe bidin.

Ji ber vê yekê em bang li we jî dikin:

Bibin alîkar ku hûn xwe û kesên din, bi taybet kesên herî biçûk, biparêzin.

Derzî li xwe bidin!

Bi vî awayî hûn alîkariyeke girîng didin, da ku xebata hêlînên zarokan bikaribe bi awayekî ewle bimeşe û di siberojê de pêşî li girtina hêlînan were girtin.

Wekî tedbîr, Welatê Berlinê ji bo destpêka sala kreşê careke din 500.000 Antigen-Testan ji bo testkirina zarokan a li gorî pêdiviyê dide hêlînên zarokan, ku hûn bo nîmûne dikarin di destpêka sala kreşê de van testan ji bo testkirina zarokên xwe bi kar bînin. Bikaranîna van testan ne mecbûrî ye. Wekî din dê hinek Antigen-Testên din ji hêlînên zarokan re were şandin, da ku ew xebatkarên xwe bi awayekî rêkûpêk test bikin.

Li gel derzî û testkirinê, her wisa bicîanîa tedbîrên navdar û heyî yên wekî bikaranîna maskeyê, girtina mesafeyê yan jî tevgerîna li gorî rêbazên paqijiyê jî ji bo hêlînên zarokan gelek girîng e.

Rêwiyên Vedigerin

Gava we betlaneya xwe li derveyî welêt derbas kiribe, di dema vegeza bo Almanayê de hingê peywirên diyar ên ji bo dema vegeerê ji bo we jî derbas dibin.

Ev peywir li gorî cihê li derveyî welêt, ku hûn lê mabûn, diguhere. Di navbera Herêma Cûreya Vîrusê, Herêma bi Rîska Mezin û Herêmên din cudahî heye. Diyarkirina herêman a li gorî vê yekê rojane tê nûkirin. Ev yek li ser vê derê tê dîtin:

https://www.rki.de/DE/Content/InfAZ/N/Neuartiges_Coronavirus/Risikogebiete_neu.html

Biryarên Rêzîknameya Vegerê ya Koronayê ji bo van herêman bi kurtasî bi awayê vê tabloya li jêr hatiye ravekirin.¹

	Peywira piştrastkirinê (Kesên 12 salî û mezintir) § 5 CoronaEinreiseV	Peywira Karantînayê (xweîzolekirin) § 4 CoronaEinreiseV
Herêma Cûreya Vîrusê	Di dema hatinê de an jî rêwitiyê de: PCR-Test a negatîv (max. 72 h) <u>yan jî</u> Antigentest a negatîv (max. 24 h) <i>(Belgeya derzî yan jî derbaskirina nexweşiyê têrê nakin)</i>	14 Roj (ji bo vê: qedexeya rêwitiyê li gorî qanûna § 10 CoronaEinreiseV)
Herêma bi Rîska Mezin	Di dema hatinê de an jî rêwitiyê de: Belgeya derzî yan jî derbaskirina nexweşiyê yan jî PCR-Test a negatîv (max. 72h) yan jî Antigen-Test a negatîv (max. 48h)	10 Roj Demkurtkirina piştî roja 1ê bi riya belgeya derzî yan jî derbaskirina nexweşiyê yan jî piştî roja 5an bi riya encama negatîv a testê; ji bo zarokên ji 12 salî biçûktir ev yek piştî rojan otomatîk diqede
Herêmên din	Beriya hatinê ango beriya rêwitiya bi balafirê: Belgeya derzî yan jî derbaskirina	

¹ Îstîsna dikarin werin kirin, mînak ji bo xebatkarên diçin û tîn, xebatkarên transportê û hwd.

	Peywira piştrastkirinê (Kesên 12 salî û mezintir) § 5 CoronaEinreiseV	Peywira Karantînayê (xweîzolekirin) § 4 CoronaEinreiseV
	nexweşiyê yan jî PCR-Test a negatîv (max. 72h) yan jî Antigen-Test a negatîv (max. 48h)	

Quelle: Bundesministerium des Inneren, für Bau und Heimat; Bundesministerium für Gesundheit

Hûn dikarin kurtenivîseke di derbarê agahiyên li ser rêbazên koronayê de yê ji bo vegeerê li vê derê bibînin:

https://www.bundesgesundheitsministerium.de/fileadmin/Dateien/3_Downloads/C/Coronavirus/FAQs_Reise/Corona-Einreiseregeln_August_2021_Update.pdf

Zarokên di bin dozdeh salî de ne mecbûr in di dema hatinê de testa xwe nîşan bidin. Piştî vegeerê heman tişt her wisa ji bo roja pêşî ya hatina hêlîna zarokan jî derbas dibe.

Wekî din rêbazên ji bo karantînayê yê li gorî § 4 Rêzîknameya Vegerê ya Koronayê bi gelemperî ji bo tevahiya rêwiyên vedigerin derbas dibin, ango her wisa ji bo zarokên diçin hêlînên zarokan jî.

Di dema vegeerê ji herêmeke cûreya vîrusê kurtkirina demê bi vî awayî ya ji bo vê sedemê ne pêkan e, bo nîmûne „bi riya testê“. Ji bo kesên ji herêmeke bi rîska mezin vedigerin, dema karantîna ji bo zarokên di bin dozdeh salî de bi awayekî otomatîk dibe pênc roj. Ji bo vê yekê ne pêwîst e, ku mirov encameke negatîv a testê yan jî belgeyêke di derbarê derbaskirina nexweşiya Covid-19ê pêşkêş bike, ku ev yek her wisa ji bo hêlînên zarokan jî derbas dibe.

Zarokên xwedî rîskeke taybet a têkildarî CoViD-19ê

Heger zarokê/a we ji ber rîskeke takekesî nikaribe here hêlîna zarokan, ku gava bi nexweşiya CoViD-19ê bikeve, hingê pêvajoyêke dijwar ya nexweşiyê derbas bike yan jî ji ber ku kesekî/e nêzîkî wî/ê xwedî heman rîskê be, hete dawiya sala 2021an derfet heye, ku bi riya axaftina li gel saziya hêlînan Welatê Berlinê bêhtir piştgiriya fîransî bigire, ango ji bo navendê an jî ji bo meşandina pergala ewle û sabît a xizmeta lînêrînê. Bi vî awayî divê tevahiya zarokan, her wisa di bin şertên pandemiyê de, bikaribin sûdê ji xizmeta lînêrîna zarokan a danê rojê bigirin.

Gava pêdivî çêbû, hûn di derbar vê yekê de li gel hêlîna xwe bi axivînin!

Xeta Telefona Acil a Dêûbavan

Ji bo alîkariya destpêka sala kreşê ya 2021/2022an Çavdêriya Hêlînên Zarokan ji 09.08.2021an hete 31.08.2021an dîsa di çarçoweya xeta telefona acîl a dêûbavan de di xizmeta we de ye. Hûn dikarin di rojên xebatê de di navbera saet 9 – 13an de bi vê hejmarê (030) 90227-6600 xwe bigihîninê.

Di dawiyê de ez hêvî dikim, ku demên mayî yê ji bo we baş derbas bibin û em tev bi hev re bi awayekî serkeftî dest bi sala nê ya kreşê bikin.

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya V

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk